



# HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar: 7/Tebax/1981



Hdu.



# HÊVI

Revîyê Kurîyê Tebax 1981

Hejmar: 7/Tebax/1981

## TEXTISTINÎ

EM DINYAKE RONÎ DIXWAZIN.....	2
BABÛTAN.....	4
GURÎYÊ KEVOKVAN.....	6
KÎ HÎN BI QEWETTIR E ?.....	10
QUNCIKÊ HELBESTAN.....	13



## EM DINYAKE RONÎ DIXWAZIN

Geli hevalan!

Îsal, dî 6'ê Tebaxê de, gelên dinê û hemû mirovên xêrxwaz cirma Emerika Yekbûyi, ku dî 6'ê Tebaxa 1945 a de kiribû, bî bir anin. Çi bû ev cirma Emerika?

Weki hûn ji dîzanin, 42 sal berê şereki mezin dî nav mîletan de derketibû. Vi şeri pêşiyê, Hitler'ê faşist, ku serekê Elmanya bû, derxist. Duvra şer geş bû û kete nava piraniya mîletan. Dî vi şerê mezin de Emerika û Japonya ji hebûn. Dî ser de herdu dewletan lî hemberi hev cih girtibûn. Şer gelek salan domkir.

Jî ber vê yekê Emerika Yekbûyi, roja 6'ê Tebaxê sala 1945 a, cara yekem bomba atomî a


vêt bajarên Japonan;Hiroşimayê.Bomba atomi,  
bombeke pır xurt û hukmê wê zêde bû.Dı wê  
gava ku bombe hat avêtın,not û du hezar mı-  
rov mırın.Nêzi tevayi bajar hedımı, dar û  
ber jı hukmê atomê şewıtın,hışk bûn.Paşiyê  
bı salan şınayi dı wan erda de dervedıket.A  
tomê jı bı kuştınê gelek nexweşi û seqeti-  
jı çêkır.

Pışti wê çend roja,Emerika,atomek jı a-  
vêt bajarê Nagazaki'yê.Lı wê derê jı bı he-  
zaran mirov hatın kuştın,mal xırabûn û dar  
û ber hışk bûn.

Bı rasti ev,cirmeki gelek mezın bû:Lew-  
ra,mırovên ku hatın kuştın,ne leşker bûn.Ha  
ya wan jı tu tışti tune bû.Pıraniya wan jın  
û zarok bûn.Loma hemû gelên dınê lı ber vê  
cirmê rabûn.Cırma han,protesto kırın.Jı wê  
rojê heta iro jı tım û tım vê cirmê bı bir  
tın.

Iro jı divê em vê yekê bı bir binın.Lew  
ra iro jı hê,mezınên hın dewletan(weki Eme-  
rika Yekbûyi) karê lı ser çekên (silahên )  
atomi dıdomının.Iro dıxwazın çekên jı atomê  
hê dijwartır çêkın.Bı vi awayi,dıjminatıya,  
mırovayi û pırani jı a me piçûka dıkın.Iro,  
divê em baş zanıbın,ku çekên atomi,me diku-  
jın,dê û bavê me dikujın û me sêwi dihêlın.  
Dınya me reş dıkın.Em dınyake reş,sêwiti û  
mırınê naxwazın.Em dıxwazın dı dınyake ronı  
bê mırın,bê xwin û bı gul û kulilk de bıjin.  
Lewra em çekên atomi naxwazın.Em bomba neut  
ron ku qıra mırovan tine,naxwazın.

HÊVÎ



## BABÛTAN

Listika babûtan lî der tê listîn. Bî hîn dıkayi jî aliyên şeş kesan ve tê avakırin û listîn. Listikvan dî nav xwe de dijîmêrîn. Bist lî kê keve, ew dibe "diya dagê".

Diya dagê lî piyan dîsekîne, xwe xûz dîke û herdu destên xwe dîde ser çokên xwe. Serê xwe jî xwar dîke. Kesên dîn hemû dîkevî rîzê û bî dor, bî bezê herdu destê xwe lî ser pişta diya dagê dîxîn û gava destê wan lî ser pişta diya dagê ye, kesê pêşî çî bêje, ewên lî

dûw wi tên pêwiste ku ew ji piyvên wî ducar  
 bikin. Yek bî yek xwe dî ser pişta diya dagê  
 re davêjin ali dîn. Bî dor ki derbasî ali dîn  
 bibê, ew ji wek diya dagê dî rêzê de dîsekîne  
 û destên xwe dîde ser çokên xwe. Yên ku lî  
 dîw wi tên, xwe dî ser pişta wî re ji davêjin  
 ali dîn. Ew ji wek wan dîkevî dorê. Cara ye-  
 kem bî tenê xwe dîvîrvîrînin ali dîn û lî  
 hevhatiya "Babûtan" jî devê kesên pêşî dîg-  
 rînin. Cara dîn hîm lihevhati "babûtan" dîbêjin  
 hîm jî qûna xwe lî pişta yên bîni dîxînin. Yên  
 bîni ku lî dawiyê dîminînin, ew jî radîbînin û  
 xwe dî ser pişta yên dîn davêjin. Bî tenê yê  
 ku lihevhatiye nebêje an çewt bêje an dî tev-  
 gerê de wek yê pêşîya xwe neke, tevgera xwe  
 şaş bike ew kes dibe diya dagê û tîm dî bîni  
 de dîmine heta ku yekî dîn xwe şaş bike.

Lî hevhatiya (tekerleme) babûtan beşek jê  
 wîhaye:

- Babûtan xweş babûtan
- Sala duduwan çûme çîyan
- Du pîran dew dîkîlan
- Mîn got: Pîrê pîçek rûn  
 Parîki nan
- Jî bo qewetbûna xortan
- Pîrê got: Ser sera û ser çavan



## GURÎYE KEVOKVAN

"Bızına mın i bı aqıl,kevokên mın ên xweşık" got. "Lawê mın dı qesrê de ketiye fe qê.Çı dıkın bıkın,wi xelaskın.Vi dilê mın î pir ji kêfxweş bıkın.Vê qıza paşê,ku hûn dıbinın ji wê bibe bûka mın.Bıra êdi pır dı tengasiyê de nemine."

Bızın rabû,pelê tuyê xwar,zû zû lı ber cıvandın.Jı aliki dıxwar û jı aliyê dın ji bışkulê minê gulla dıkır.Jınikê tendûrê ve-xıst.Sêl da serê.Jı kevokan re genım qeland.

Çûn bani kevokên dın ji kırım.Kevokan , gulla xıstın nikulên xwe,çûn ser qesrê bı se rê leşkeran de barandın.

D1 taritiyê de j1 destê leşkeran tu tışt ne dihat. Wezir derket hîzûra paşê:

"Çend seeteñ dîn jî wîha here, tu kes na mine" got. "Ferman bîke em Gurri berdîn. Dawiyê emê lî çareki mêzekîn."

Paşe ferman kîr, hemî deriya da vekîrîn . Dawiyê bî dengekî bîlînd got:

"De here, Gurri here, dawiyê ez zanîm jî heqê te derêm."

Çend deqe derbasbûn, nebûn dengê Gurri jî bexçe hat:

"Paşeki wîha dîke lî xwazgîniya? Bî rastî qet lî te nayê."

Paşê qîriya got:

"Serseri, bî te ketîye qîza paşê xwestî?

Gurri cardîn deng kîr:

"Tu qîza xwe bîdî, ezê jî kevokên xwe re bêjîm êdî wê bî ser qesra te de neyên. Ez jî





qiza te hezdikim, ew ji ji min."

"JI niha pê de qizek min i wiha tune." Paşe got. "Ezê a niha wê qizê ji qesra xwe biqewirînim."

Ban notirvanan kir, şand oda qiza xwe. Notirvan dest vala vegeyan.

"Paşê me, qiza te ne li oda xwe ye," gotin.

Gurri edi zêde li wir ne ma. İşaretek da kevokên xwe û rêya malê girt. Li malê diya wi ya pir, qiza paşê û qewraşa wê şir germkirîbûn vedixwarin.

Gurri, bi tîştê gava qiza paşê hatibû bi xwe re anibû û weki din bi qezenca kebata xwe û diya xwe jina xwe domand. Domand, lê dibêjin ku hêji dirika kom dîke, kevokan difirîne û bızina xwe li bin dara tuyê girêdide. Ji na wi û diya wi he hiriye dirêsin.

Qewraşa ku bi qizikê re ji qesre reviyabû ji ji koletiyê xelas bûye. Ew ji zewiciye û ji xwe re jiyaneke nû daniye.

Dî vê nabênê de, Heci Eli û dewlemêndên din, hêji derdikevin hîzûra paşê û loma dikin dibêjin, ku Gurriêrişa dîde ser mala wan. Paşe û wezir ji seri dane hev, bo bi dest xîstina Gurri û kevokan, xefikan çêdikin. Ji ber keser jêkirina lawê xwe, bo ku wezir deng ne ke, vê carê lawê wezirê biçûk kirine fermandarê qesrê.

Hemixewroşkvan, piştî ku axaftin tê vira, dibêjin "Ew gihîştine miradê xwe". Dîdîn beyan kirin, ku axaftinên wan xelas bûye. Lê ez baş dizanîm, ku xewroşka me xelas ne bûye. Helbet rojekê wê dumahika vê xewroşkê ji bê nisandî.



## KI HIN BI QEWETTIR E?

Valery SUSLOV

Alec her ku firsend dıdit, jı Antono sewal dıkr:

-Bılındiya ezman çı qas e?

-Behr pır kûr e, an Oqyanûs?

-Tu kari erdê qul bıki û jı aliyê dinê dın ve derkevi?

Alec ira ji dıxwest bıgihê Antono. Hım dı da lotıkadı meşiya û hım ji, jê dıpirsi:

-Filek pır bı qewet, an masiyê balina?

-Jı hemûyan ki jan pır bı qewete?.....

Anton dı lezan; jı ber ku ew êdi mezin bûbû û pır tıştên wi yên cêkırana hebû.

Lê Alec, sewalên xwe lı ser hev domand:

-Ki pır bı qewet e.? Bêje jı mın re.

-Anton jê re got, winca lı wır tu dıbini?

-Vagonekê radıke.

-Ev tê wê manê ku, wê fileki, an ji balinekê (ma siyekı mezin) ji wek perrek, bı hêsani (reheti) karıbe rake.

-Alec heta nuha qet lı vê yekê ne fıkrı bû. Demekê qet ne peyvi û fıkrı. Pêre cardın sewal kır:

-Ma jı wincê ji, tıştêki bı qewettır heyê Anton?..

-Ev tırêna ku pênci vagonên bı bar lı pey xwe dıkşine tu dıbini?

-Wagon, hemûyên wan heta ber dev bı barın. Tê gotın tırên, jı wincê hin bı qewetire, ma ne wı lo ye?

Alec bı dengeki hêdi:

-Belê wılo ye.

-Lê jı tırênê hin bı qewettır çı he ye?...

Anton, Alec rakır hewa û dani ser diwarê kêlek bahrê. Got:

-Lı dera han bınêre! Keştiya (gemiya) ku bara dibe tu dıbini? Sandoqên text, fıçiyên şarabê, baliyên mezın, wê bigre bibe bahrên geleki dūr Jı ber ku, 25 û hetta 30 (sih) tırên karın têke vin hundurê wê, ango hewqasi mezıne. Wê vana hemûyan dı ser bahrê re bibe. Bı rasti jı mıjare ku, merıv lê bıfıkır e.

Alec, dev jı hol bûn û lotıka berda bû.

-Lê Anton, jı hemûya bı qewettır çı ye?

-Yê pır, lê pır û pır bı qewet çı ye?

-Êdi bes zorê bı mın de Alec! Tu bı xwe lı wı ya bigere û bıbine.

Alec fıkrı, lê belê nıkaribû tu bıryar bıda

-Dawiya dawiyê got, hadê tu jı mın re bêje.

-Laşê wê winca mezın, ki çê dıke? ki, wê tine rewşa xebatê?....

Alec got:

-Ez nızanım.

-Teknisyenê (ango hostê) wincê .

-Pêre.....lı ser raya dımeşe û pênci va gona bı bar lı pêy xwe dıkşine, kê çê kırıye?

-Muhendiz.

-Jı bo ku, tu keştıyakê (gemiyakê daxini: bahrê, lazımiya te jı çire heye?....

-Ez zanım!....Kaptanek û hın karkerên dın.

-Başê keşti, tırêna bı ceyranê, vinc...., kê va na hemû çê kırine?

-Însanan

-Başe.....wê demê tê gotın yê pır bı qewet kiye?.....

-EMIN!.....



## QUNCIKÊ HELBESTAN

Geli hevalan  
Helbestvaneki Kurd jî Kurdîstana İraqê bo me  
mindalan gelek helbestên xweş nivisiye. Navê  
helbestvan Abdullah Peşew e. Niha em jî pirtû  
ka wi (Duwanze wane Bo Minalan) çend helbes-  
tan li jêr bo we dinivîsin. Ewî bixwe helbes-  
tên xwe bîzaravayê sorani nivisiye. Lê me li  
vîr, bo we wergerandiye zaravayê Kurmancî. Ga-  
va hûn bixwinin, em bawer in ku hûnê gelek jî  
wan hezbîkin.

### H E V Î

IX

Mindalan!

Yê denkegenimeki çand  
Sîmbîleki paleyi kird  
Yê dilopeki xwini çand  
Tabloyeki bo xwe nexşand  
Ewê tenê  
Hawareki jî dev der çû  
Guh li seda dengê xwe bû.  
Ger çî em  
Kaseser û çav dîçînin  
Barana xwinê  
Bî ser wan da dîbarînin

Hê ji dema  
Paleyaya me diyar nine.  
Ta simbilê şûva  
Wê xwina me ji diyar nine.  
Mindalan!  
Bira wê cuhê bigorin  
Ku xwina me pê de dere  
Bira wê zeminê ji bigorin  
Ku çav û kaseser dixwe  
Îcar şûva roniya te  
Nişani te didim.  
Îcar wextê paleya te  
Bo te rast dikim!

X

Mindalan!  
Lî ser borîyê neftan,  
Lî diwarê  
Avdestxanê mîzgeftan,  
Deh milyon car  
Nivîsiya me: "bîjî sitembar"  
Nivîsiya me: "bîjî kirêkar"  
Lê belê hemû nivîsin tenê carek  
Nîkaribûn bîbîn pari  
Têrkîna zîkê kirêkari!

XI

Mindalan!  
Ey bê hêlin jin talan  
Bî şev di xew de rêwîki bûm  
Ber bî deriyê "Yûtan" dîçûm.  
Ku derî ez daqurtandim

Deşan mın dit-ala wan hebû  
Spiya mın dit-ala wan hebû  
Her kê mın dit- ala wan hebû.  
Ew qijıyan:  
"Ey bê welat ber bı derva  
Ey bê ala ber bı derva"  
Mın ji gotım:  
Meqijının!  
Ku bıçım  
Vê çirokê  
Bo mindalan  
Dıbêjim.



ASTRID LINDGREN



Keça  
Şerrût  
Lotta

(Kİ)

(Kİ) Kurdiska Forlaget

Alfons  
O. CARLSSON



Mayasala Nibel

DU PIRTÛKÊN KURDÎ  
BO ZAROKAN DERKETIN!



H Ê V î:

ADRESS/NAVNIŞAN:

Kovara Kurdi ya zarokan  
Kurdish children magazine  
Kurdisk barn tidning

Hêvi: BOX 5034  
163 05 Spånga/SWEDEN  
Postgiro: 439 33 42-3

ISSN:0280-0241

PRIS/BÛHA: 3 kronor - SUBSCRIPTION/ABONE: 30 kronor per år